Pêncxiştekî leser xezelêkî şêx Nûrî
Berhemî: Ehmed Herdî (1922-2006)
Le kitêbî: Razî tenyayî

Qet nedey azarî giyanî mest û bêdaranî şew
Xot nexeyte ber şepolî eşkî bêpayanî şew
Ey kiçî xwawendî cwanî û ey çiray dîwanî şew

Xot biparêze le ahî dilbirîndaranî şew
Nek xwa nakerde gîra bê doay nalanî şew

Wêlim û tarîke dewrim, ferşî rêgem meynete
Bêkesim, tenya enalim, mergî xomim ezirete
Sazî ahengî şewanim, sozî cergî let lete

Yawer û yarî enîsim ah û eşkî hesirete
Aferîn ey barekella, dîdeyî giryanî şew

Wa nezanî destî xem yadit le dilda der eka
Eşkî xwênînim delîle bo kesê bawer neka
Giyanekem bew tîşkî çawey şer legel exter eka

Dil ebête qetireyê xwên û le dîdem ser eka
Her ke rabûrê be dilima suhbetî caranî şew

Hawdemê fermûy: leberçî kirdewet giryane her
Tafî lawêtîte, lawî, qelbezey seyrane her
Min witim seyran û xoşî pêşkeşî şadane her

Eşkî hesret lazimî cem`î siyabextane her
Şewnimî subihe delîlî qetreyek giryanî şew

Hewilî zorim da, le dawî zulfî ew bêmirwete
Derçim û dûwayî bihênim bem ezab û meynete
Pêy witim bêsûde hewilit, takû mawî cêgete

Nûrî lem pêç û xemî zulfe necatit zehmete
Lay sexîteb`an mehale ruxsetî mîwanî şew

1948
Helebice

Serçawe: saytî Vejîn
https://books.vejin.net/ck/text/410